Ezîz Xemcivîn

Keserek, gunehek û pirsek

Helbest

Keserek, gunehek û pirsek

Keserek, gunehek, pirsek

û li ser darê çivîkek...

bi wan dehfên çavan

bi peyvên nermok

ji peravê şemitî

ji giranî û payê lebitî,

ji kewara girî

melîkê ew da der..

bila tu xemgîniya goyînan bibilînî,

li hêlînên payîzê

bi nalîn in..!!

bila tu

li keçîniya sozan çavdêr bî

da li ber ba neçin...

bila tu di zeviya wê xewnê de

tovê biçînî!!

Bi hêviya hêviyê bimînî!!

Lawik û Heyranokan

ji berbangê re bistirînî

çavên xwe li roniyê bigrî;

roniyê bikî bajar

li kolanên wî

tê bihna windayî hilm bikî,

tê ava çikyayî

bi kanî û rûbar biherikînî!!

Were dilo bê tirs

şax ji hev cuda ne,

hêlîn li ser wan havîngeh in!!

Bi dîmenê evîna tilûran

tê xwe ji nêv razên pêçayî

wekû sawîran azad hilînî...

li hawîr te kêferat e,

lingek li pêş e,

yek

di çixêza êgir de likumî !!

û

rawestana demê jê re

zincîra matmayînê ye…

ew biryara te da,

agir vedida..

Ceger bibû hêtûn

ne name gihişt,

ne sarinc,

ne qeşa golan ko werdek li ser bûn

vemirandinek dida...

Serjimar bû ji gunehan re,

Pel şewitîn

û bîranîn li ser "pira sîratê"

strana

-Dolabê hey dolabê-

li ser let-let û bir bi bire...

ez her wek çiyakî te dibînim,

hîn bi wê bejnê,

hîn bi wê sawê

li mejiyê min î tedayî

nivîna te Mişkokê

bi xirocir e..!!

ne bar dike,

ne sar dibe,

ne jar dibe,

ne xwar dibe

û ne tarûmar dibe...!!

Ezîz Xemcivîn
5/11/2003

Lê dîlberê

Çi name ye ko bi navê dîlber e.

çi jîn e ko bi navê te dest pê dike,

bi te diraweste

û bi te digere…

Erê…. erê…. dîlber

Çendî Memoyê te lal e,

zindana wî kûr e,

rêka wî dûr e…

Erê… erê … dîlber

Kewê te

qebqeba wî digihêje asîmanan,

Stêrkên dijimêre,

Kengî sibeh wek lêvên te

Sorgulên xwe

li ser parçên ewran raxîne…

Kengî silavên dilan

Li ser basikên perwanan bişîne…

Erê… erê… dîlber

ev peyvên mişexet

gelek sînor birrîne,

gelek kaş, zinar û newal gavkirine!!

şevên zivistanan

li ber baranan qefilîne…

weke motikan li hêlîna te ne,

germa li ser wan, germa wî dilî ye,

bihna li ber pozê wan,

bihna Yasemîna li pencera te ye…

birûskên awirên wan,

tîr û xencerên kenê te ne,

şahiyên hevokan

ji nav pêlên pora te ne,

henase û oksicîna pişikan

ji bihna buhara sîng û berên te ne,

xwîna can

ji zinarokên herdu dêmên te ne…

Erê… erê… dîlber

Helbestên min,

bê te wek Berazên bejîne,

wek Çikçikanên nebeďîne!!

li kolanan pêxwas in,

ne ser û ber ji wan re maye,

aşê yek dilî nema digerînin…..!!

war û hêlîn her rewanê te dimîne,

lehiyên hest û nestan

ji ciwaniya te diherikin…

Çendî top û tifing berê wan bi min vebin,

ez bawer im tenê wê a li destê te

bê gule û fîşek û teqînok be…!!

Çi nameye ko bi navê dîlber e,

Çi kulîlk e ko roj ji buharê dide dere,

Çi ronak e ko li Şamê li ser textê Selahedîn e..

Çi peyximber e li ser zimanê Belqîs

namê dixwîne ji ezbere….

Taca Kisra ye

Kewa çiyayê kurmênc e,

Kotira li ser pira bafid e,

li Dêrika Hemo bi xeml û xêz e…!!

ava zelal e

ji serê kaniyê diherike,

meya lêvan herdem ava jiyana evîndar e…

li ser dil û cegerê avesta pîroz e,

ji mêj de olperestên evînê

ewan destan diramûsin,

sawa ewan awiran

wêrekiya min hîn jî dihejînin…

Dîlbera min,

tu nizanî; pênûs evîna te

di kûraniya damarên min de dipêje…

Evîna min,

ma tu nizanî strana payîzî

ji derdên te koçer e..

qulingên dilê min bi demsalên te re rêwî ne…

Erê ….erê dîlber

çendî şevên dirêj hilm û bihna min dîlkirine,

hêtûna xurbetê sosinên hevokên min sotin e,

û bi dûrbûna te hemû reng kizirî ne….

Her şev

di xewna hevdîtina te de me,

çawa te bikim çîçek û deynim ser dilê xwe

her kêlîkê te bîn bikim

bi xewnên gulgulî ezê dîsa yasemîna te

bibîrbînim,

û li vê oda "xirûxalî"

çivîkên bîranînên te ji her alî

li dava hişê xwe bicivînim...

Îmarat/
12/9/2003

Biyaniyo

Te çavê min

bi tariya berî berbangê xapand,

te dilê min

bi xatirxwestina stêrên

bê veger sotand…!!

Biyaniyo!

Te çira li ber konê

xemgîniyê vemirand…!

Nema zanim,

hêrsa stranên xwe

li ber çi bayî bilorînim…!!

Felek li min hildibe,

nahêle xwe ji bîr bikim,

her kêlîkê Biyaniyo

te birçîbûna min î tazî

bê lihevpêçan û eşkerekir….!!

Bi xwe li xwe dicivim,

navê xwe dikim sira bayan,

li nêv girêka xweziyan,

li ser pişta Xalxalokan

ji rokê re dişînim…!!

Bi tenê serma nivînê

ji biyaniya te hiltînim,

karwanê

perperîkên bendewariyan

gelek

hilma min diçikînin….

Biyaniyo

tenê li ber pala sîngên sêvîn

tu radizî,

li bazara Dam û Şeşrengan

tu bi êgir dilîzî..!

carekê tenê

tu ji min re ne bûyî baweşîn?!

Dilooooo, dîno

Biyaniyê te jî dîn e!!

li şaristanan,

li biyabanan,

bi stranên hozanan

sirûda hevdîtinê

bi awaz û efxanan

ji Kevoka Zajil re dixwîne..!!

Biyaniyo

ma te bêriya

darê Zeytûnan ne kiriye?

Ma te bêriya Benîştê xezalan

li beriya sînga min ne kiriye?

ew buhar, ew Tolik û Kulîlkên Nîsanê,

li bejn û bala min bigazinin!!

li hêviya destên te yî pîroz in,

li hêviya pistepista çavên te ne,

destarê dilê min xopan e

ji hêrana hestên te

xiroxalî dimîne..!!

Biyaniyo

sawîr û wêneyê te

di semaya civîna min ferzendê de

bûye pûtekî pîroz,

bûye Hurmizê xewnê,

bûye çiraya geş

li koçka Pîrê muxan,

li her hêtî bi cî dibe..!!

Min dike

Mîra Çînê

Pireke mezin ji min re ava dike

tena-tena li ser diçim û têm…

Biyaniyo

Bazê li kohê bilind,

Poşekê ewran

ji ku ezê ji nûv de

milê xwe bi milê te bixînim…

wek bilbilekê

serê sibehê ji te re bixwînim…

rêka te da ser

kuç bi kuç

gav bi gav

pîvan in,

di bin hêza raz û veşartokan de

tu wan dinixumîmî…!!

Belê te ji bîr kir

Siya dara

ko em herdem li ber dirûniştin…

te ji bîr kir

koçk û seraya Yildiz

ko te ji bo min avadikir,

û der bi der lê digerandim..!!

Biyaniyo

tu dizanî,

ew meşên li ber peravên

ewan gol û kaniyan

li me çûn gilî..!!

derdor û tixûb û

pût û latên Keleha Hesen kêf

wa ew jî wek şahiya me binav dibin..!!

wilo şemala di kildana hêviyên min de vêketî

li ber bayê biyaniya te

dike ko rewan bide der..

wilo sîtava li ser pencera min î herî bilind

roj bi roj hetav dide ser….!!

Biyaniyo

Baba Derwêşo

rûpelê mande û paşeroja evîna me,

bi tûjaya pênûsa girrê xwe

diqelêşî,

û rewan ji hevokên hogiriyê tu dibirrî !!

hin li vir şerpezebûn,

hin li wir li bin lingan melisîn,

û hin di hêlana cudabûnê de

em wan dilorînin…

pirsê ji mija li ser çemê xêbûr,

ji kaniya Banos,

û ji çavkaniya Kebrîtê bikî.....

tu bihnekê bikişînî;

da ez awazên bêrîkirina te

bikim pîşo

têkim devê vê birînê,

û duriyên ko li hiş hatine pêçan

pêk bikewînim!!

Hem xweziyên dîl

Ko li hinavan kurk û qerimok in,

Mîna Çilkên jiyanê

li germa dilî û kelkela xwînê

dilivin...!!

Biyaniyo

ji wê roja te tevin

li çîroka me rêsa,

roja Gamasiyê biryarê

vîn û arama te

li ber pêlan berda,

roja te "Pîtza û Hamburgir"

da ser Nok û Nîskan!!

Şahînê evîna te

ko bi dehê salan

li hembêza min kedî bû

bê sansor,

bê dehf,

bê tor

û bê rekeh,

her yek ji me

li asîmanê hilm û bihna buhara xwe

bi serbestî firiya…!!

Ezîz Xemcivîn

Îmarat

Abudahbi

9/12/2003

Azadî

Di-axive û derdên xwe

ji hinavan davêje...

dilîze û kesera biçûkaniyê

li ser çogan diguhêze...!!

diçe başûr

li ser pêlên bayê evînê

li ber kenê

kevir û lat û hîmên rizgarbûyî

li welatê rokê,

li çiraya tariya koçkirî,

bi kurmancî

bi Beytik û Bilbilan re dipeyive!!!

Ji zimanê xweş û geş

Sinbil seridîne!!

û ji sinbil û keviran,

ji awazên tilûran

rengê ala xwe danîne!!

Li ber roniya dilê evîndaran;

li helbestvaniya çiyayan

Siyamendo bû padîşah û

Xecê bû xatûn

û xwîna pezkovî bû Kişwera evîndaran....

Kew bi qebqeb in,

dasîtanên pêşmergan

her sibeh dixwînin...

çiyayê serbilind,

bask vekirî

bi hezaran kulîlk li hembêzê

ew rengên tevlihev

çîrokên qehremanan

ji neviyan re dihûnin....!!

wisan Memo li seyranê

bi destê Zîna xwe girtiye

nema diltirsê Beko ye,

dêmên hîvê diramûsand!!

Dayê "Hemayil û dayê Mîna"

li dû Barzanî û Qadî

li hesspên rewan siwar in,

ji meydana Çarçira

ala rengîn

li ser baskên qulingan vedigrin,

li kohê Helgurd

dikin sîtava hêlîna Baz

rûgeş beramber stêran diçirisîn in....

pencere vebûn

zincîrên rekehan perçivîn;

Şalûl û Qumrî

ji tora dîliyê firîn,

pênûs û perîk

rûpel û tabloyên

nivîskar û hunermendan dixemilînin...

Ey roj îro roja sirûda te ye

"Ey reqîb her"

dengê Laleşê bilind dibe

li Dêr û Mizgeftan hogir dibe

sefîraz im, serbilind

ney û naya Zeradeştê pêximber

ji bal yezdanan ronî veda,

weke hemû olan

bi nasname ne em,

passporta me Zend Avesta

Ji Amûdê Heya Bi Efrînê

Gava du dil

bi hev vêdikevin…

agir, xak û xwîn

bi hev re dibin yek..!!

evîna min

ji Amûdê ta bi Efrînê

ez keziyên bîranînên te

dirêsim…

ji koçk û seraya Êlo

ta bi keleha "Nebî Hûrê"

pênûsa min pêxwas

li rûpelên pêjna te

hûrik, hûrik

bi gavên xwe yî melesî

tîpên kenê te

mîna lavlavkê

li hev dihûne …!!

Ji kengî ve ez

van kevokan li asîmanê

xewnerojkan difirînim…

ji stûrbûna tariya ewran

birûskên hestan ji te re dişînim..

agir ji ser "Pûtên Azer"

bi arama "Birahîmê pêximber"

divemirînim,

"agiro gewr û ronî be, li evîna Mem û Zîn"

wisan bi meşa xwe

bi bal te de

strî û kelem

pêyên min na êşînin!!

Ez xwedanê evîna mezin im,

xwedanê bade û meya kevnar im,

tê bîra min

gava serxweş,

ji dêya xwe re çêbûm,

ew kêlîka tu bi giriyê min re dikeniya yî;

û berberê te bû

ê ko navika min birrî !!!

weke Bazekî bê hêlîn

min çavên te ji xwe re kirin

keşwer û keleh,

hingî ez tî bûm

dijî rêdan û destûran

li kaniya sawîrên te

dawî ez bûm Keleş,

bi mêvandariya xaka bav û kalan

Orgeş û Burca Belek

bazinên xwe

li razeyên min û te pêçan…!!

Êvara mehrbirrînê

xweziyên me,

xwe

li bextê Zerdeştê kal girtin!!

Ta destê sibehê

"Mûhemed" şivantiya me dikir,

"Isa" jî keriyê berxikên xwe

li deşta hilmên me diçêrand…!!

Gemiya "Nûh"

cotbûna me parast…

xwêdana xewnên me

ji pertûkên pîroz herikî,

bû mohr û ramûsan

bi tîpên zêrîn

li ser dîwarê Laleşê çapbûn…

bi soz û peymanan

ez bi xirqe û bendik,

tu bi kofî û şalê kurmancî

me berê xwe da perestgehê!!

bi şêx Adî û Tawisî Melek

bi ava kaniya sipî

bi roka subhanî

me berê xwe da rojhilat,

û çixêzek li dor xwe gerand..!!

nivêja jiyanê

li dûv şêxê xwe me divegerand;

roniya heyvê bajarê me bû,

sosinên welat

havîngehên xewnên me bûn.

Ev qasî li ber çavên min

tu bibû dara çinarê

wek bilbilekî sêwî

awazên min

li pêsîrên şaxên te dibaniyan…

Efrînê bi gazinên xwe

ez diguvaştim,

çawa tu hat û te gulek ji xaka min çinî?

tu tê bilbilan

ji dilê min diqewrînî;

tu tê û stêran ji asîmanê min hiltînî!!?

Bêje mêvano… bêje

çi bêjim can im?

ez lawê Amûdê, Qamişlo, Serê kaniyê,

Hasekê,

Dêrikê, Kûbanê, Dirbêsiyê û Efrînê me..

lingên min

dehfikên sînoran dişikînin, diperçivînin…

ez lawê te me

xwedanê hêzê,

Henano û Mihemedê Deqorî me!!

Ez destgirtiyê evîna jiyana te me;

ez Zorba yê Kurd im,

Siyamendê Silîvî

li xaka sar û germ

Zeytûn û genim im;

ez donê Sînema şewitî me!!

Ji sersalan ta bin salan

ez li canê te mûma vêketî me!!

tev ko laşê min perçe perçe ye,

zû bi zû na axive..

li bin zinarê birîndar im.

Bi nasnameya pûç

dixwazin

dilê min ji evîna xaka min bibirin???

Ev Reqîb e;

"Pepaz û As e"

li xaka min xerîb e..

lê ji kul û derdan diya me îro bivênevê

strana "weyla li min xerîbê"

li perîşaniya min dibêje...!!

Ez lawê xaka xwe me

ta di xewnan de jî dîl im!!

"bibûrin...xewn qedexe ne!! "

li zindana mezin

mişkên me jî

ne xwedanê şeva xwe ne?

Efrîna min

tu bawer bikî

ronaka te ronaka min e,

buhara te buhara min e,

Keşe û Mele çi bibêjin;

em ne Erebistan in, ne Tirkistan in,

û ne Faris in!!

ez û te neviyên şikefta şînder in,

Serxet em in, û Binxet jî em in,

Pepûkê kengî tu şiyar bibî

tê pêsîrên hezkirina xwe

di devê min de bibînî !!!

kengî tu perdê

ji ser buhara xwe hilînî;

tê min perperîkî

li nêv kulîlkên

Sêv, Hirmê û Mişmişên xwe

bi serbestî bifirînî..!!

sîng û berên te

ji min re paldanka jînê ne,

wisan Berxekî mîjoke me

ji zayînê ta bi zayînê

bi shevnema canê te

firşik dibim….!!

Imarat….Abû Dhabi

26/1/2004

Ji êvar de

Ji êvar de

ez baskan

ji peyvên xwe re çêdikim;

dikim nakim

ji ber bayê evîna te

nikarin bifirin..!!

ji êvar de

çiraya dil geş dikim

xwînê ji dêvla don lê dikim,

dikim nakim

bê nerîna te

ronî nade..!!

Ji êvar de

Keleşêrê xwesteka min

li ser bana bang dike,

agir li pirsan har dike,

lê dikim nakim

bê zimanê te

deng jê dernakeve..!!

Ji êvar de

cergê xakê vedidim,

paxiran;

zîv û zêran jê dibim,

li ciwaniya

sînga yara xwe dikim,

lê dikim nakim

rewanê firyayî

bi cî nabe..!!

Ji êvar de

xezala peyvê

li ser lêvên te mexel e!!

çavên te

kayînê dikin

û Şêrê dilê min

dike nake

nikare wê bide ravê..!!

Ji êvar de

te ez kirime

dîlê meya suhbetê,

sermest im;

gulav

û

enber e;

li vehejîna te

ji sed qonaxî têm,

berê xwe didim

civanê xalxalokê

dikim nakim

li hember

nikarim bilivim,

û li dor

laleşa xwe bigerim..!!

Ji êvar de

masiyê hêviya min

di derya bêdengiya te de

terqiyayî ye,

ji ber kareva

sîwana civanê te

geh wek

kosî ye,

û geh

kevjalekî meş leç e,

dike nake

bi dûrbînê jî

rêdûr û windayî ye..!!

Ji êvar de

destê heyva evîna min

li ba dibe,

li sosin û sinbilan

silav dike

li dûv te ey ronahî

dikim nakim

ronahî nabe..!!

Îmarat
Abu Dhabi
14/4/2004

Ezîz Xemcivîn

Sibehên Şîrkî

Gava sawîrê te

li çavê xwe dinixumînim,

365 sibehên şîrkî

li ser tiliyan

dihejmêr im..

û di rewşena rewan de

hiltînim..

Sed î,

bi navê te bi nav dikim

sed î,

ji çavên te avedan dikim

û sed û şêst û pênc

hespan bi zêr û paxirên paqij

ji dilê te bar dikim..!!

Bişirandina sirûda

gavên qitikî

li germa kadîna hestan

ez kedî dikim..

Hevalcêwiya can,

bi oksicîna

malzaroka evînê

ji damaran jiyan dikim..

kevanê heyva şermîn

li serpêhatiya me

dibe Xelek,

dibe Gerdenî,

dibe Demjimêr

û dibe Hine û Hinetîtik

li destê Hûriyên buhiştê

dibe şekrokê xweşiyê..

Roj baş bû,

hilma min bi hilma wê

jîn bû..

pirsek demê kir

gelo

nêrgiz

li zivistana kenê wê

tenê geş dibe?

Lêbûrîna xweşiyê

û nazikbûna pistepistên te

weke kevirê Laleşînê

piroz dikim..

Şûşeyê meya sêvan

ji bin serê pêsîrên hevokan,

ji awirên tevzînoke,

û
ji kofiya keçika Berazî

bi bilêtên şevînî

derbasbû…

kilê çavê belek

kir dergehê diyalokê

coka tevlihevbûna

herdu xwînan

û

baweriya destpêkê

hilma karwanê sawîran

li vê demsala evînê

li sînorên strî û qamirî

ko evan lingan ew gavkirin

weke Eskenderê du qiloç

burca befrînî

li ber roja xweziya min

talan bû,

cîhana te rojhilat û rojava

destê min

li ser kewara bişkojan,

bi destê silavê

te zindana hevpeyivînê

li ber min vekir,

paşîva rizgariyê

li ser masa dilî

li kavilwêranê

Zîna Zêdan

qawan û nêrgizan

pelgan riwê te dorpêçkirin..

Bi Xaçê min,

û Tawisê te

Salar bûm

li ser xaka Mîdya,

sîng û ber vebûn

şîregul

bi ser lêvan ket..

riwê heyvê sipî bû,

guhê peyvê

li ser navê te herdem fêr bibû.

Pênûsa li nav wan tiliyan

bi sir û sosret bû,

tîpên serxweş

ji meyxana zimanê te

bê hiş û sewdan

li ber hêtûna agirê dil

bask şewitîn

û rivîn giha

movik û şaxbilindên razeyê evînê..

razeyê tevdîrê

em li tora hev

gerandin..

pûşik me bi devê xwe anî

li ser keviya dîwaran

me bi hilma firehbîna xwe,

tîrêjên beyanê

bi gulavan

hûnandin..

kêlîkên qedîfe

li bin hembêza narincî

24 demjimêran

hêlîn bi hemî zar û zimanan

di axivî….!!

Bisk ji ser dêman min dane alî..

du stêrkan

ez

dame ber tîrêj û birûskan..

dev lebitî,

ziman jipiyan ket û li hev herbilî,

"Elîf û Bê"

nema ketin dehfan

geh birin û geh anîn

û geh

xwe li berZendavesta pîroz

da ber soz û sozdariyê..

Xwendina nama pêximberan

şiroveya niviştа jîn

ji gava yekem

çilka "Baba Adem"

li malzaroka diya jînê

çêriya..

Ji kêferata nêr û mê yê,

û ji xuleka afrandina yekemîn

navê me

li serjimara nasnameya jîndariyê

hate danîn..

me ta û ba girtin,

me xweziya xwe

ji tûrikê gewriyê

serbest kir..

Nizingî hev

em rût û şût

bi pelên daran

bûn xwedî derpê û kiras,

hinan

em kirin rekehan,

hinan em dizîn

û hinan bi Yûsiv pêximber re

li binê bîran em jêrzemînan kirin..

her ko zembîl bi jor diket,

ji devê Çîçikan bêtir

me henase dixwestin..

Şev li bejna mebû

nivîna bi hingiv pêçayî,

di nav de

weke du Hingan

per û çengên me li hev badayî..

Wilo 2619 sal

temenê civîna min û te,

laşê me ji hev ve nebû

pêjnên can li canê te

hingûr dibin…

çar tîpên te pijikîn

derdor û sînor birîn

bi hêza xwe

li talda sîberê

bi ramûsanên kesk û sipî,

sor û şîn

ez didim hev..

Sîmir difire

ez û te li bin

nigara xunav û mijê ne,

gul

perest in,

jîn

perest in,

û bi evîn

û hest

û nestan

serbest in…

Ezîz Xemcivîn

6/4/2004

Abu dhabî Îmarat

Esmerê

Kenê şevê bi lîstokên Berçemokan re,

ne ba pêlên xwe dirawestîne

û ne

Esmera min awiran ji çavan dişikîne..

ji mêvandariya stêran li şeva perestinê,

li asoyê evînê,

li ber sira bayê oxirê,

li bîrhatina fîxana Xecê,

li ber nalîna Siyamendê birîndar,

li şopa Pezkoviyê "xedar",

li beyabanê "Mecnûn"

û li hêviyên çiyayê Cûdî..

Hey xanimê ...

nalîn û kalîna dilê min li nav pencên evîna te

dîl û girtî ...

tî û birçî ...

bê hêz û pepûk û kedî ye..

lê lê bermalyê şihîna bêdengiya awirên te

li ber hizra min bilind û bilind e,

birêza min serê min carekê

li nav geliyê memikan deyn û bilorînî,

dibe ji kêlîkekê bibe demsal,

buhar, buhişt û jiyanek ...

Heger tav bên,

terez û bahoz

serê min ji talda rezekî biçe ber yê din,

û hîn destên te li ser min sîwan in,

di ber re lêv yek çiva bidin cegerê,

jiyanê ji hirmêyên hinguvîn bimijim..

bîna vînê belav e,

li çarçewekê nizanim

li şeveke kirîstalî,

li deryaya te bûme kelek

nizanim çima ez dîn im.. ?

gelo pêlên evîna te har in ?

min bilind û nizm dikin,

nizanim cîhana dildariyê bager û babelîsk e.. ??????

nizanim heyv e, gava ez pê li xaka wê dikim,

difirim, bê giranî dibim??

gelo hêzê bê hêz dike?

Yan sîvanokê bê ceger û dil dike???

Pirs in; bi tirs in;

bê bersiv digrîn û diçin….

Esmera evîna min;

bi şeva te re,

bi roja te re,

bi hingûra meha te re

û bi buhara axaftina te re,

çirayên damarên min geş in,

stran û lîskên tiliyên min deng zelal in,

ne bilbil in û ne şalûl in..

belê nivêj in Zerdeştî ne

li hicrika te Şêx û Pîr im,

herdem te weke kaniya sipî dibînim,

sobelan û melevaniya min li wê jiyanê,

li wê hembêzê ta ebed ez dê wê bi şahî biburînim….

Abu dhabi 21/5/2004

Qurbaniyên cejna qurbanê

Diyarî: Nêrgizên Hewlêrê; pakrewnên Kurd li cejna qurbanê

Çiya xemgîn in!!

Rê û xanî û zarok xemgîn in!!

Berfa me îro xemgîn e!!

Helepça binere:

çima ev xak herdem xemgîn e?

welato

dibe ko patrola te,

ji kaniya xwîna kurdan dizê!!

Derya ye…derya ye…

roja reş

ax.. ax..

roja reş

cejna qurbanê

reş e.. reş e..

kulîlk li kurdistanê

têne kuştin..!!

ax birîndar ez im..!!

dil bi êşa giran ez im..!!

Helepça binere

bihna dûmana mirinê

ji asîmanûê te tê

ta bi nêrgizên Hewlêrê

zincîra mirinê

li dor me diçe û tê û dizîvire..!!

cejna me îro reş e,

roja me îro reş e,

barana mirinê bi ser me de dibare…

teqînokên dijmin û teroristan

şahiya cejnê kuştin…!!

şahiya zarokan di nav xwînê de hiştin…!!

li bin zînatê,

li bin zorê,

li bin kîmya

û kuştin û qirkirina însan…

ax li evê roja reş,

ax li evê cejna nexweş,

cejna heciyan e;

gelî xwedê nenasan

em jî misilman in…!!

welato

ma kulîlkên te tî bibûn?

yan xaka te ji xwînê ziwa bibû?

welato

ma Helepça, Enfal

Kelhe dizê û

yan kuştarên li Mehabad

û Dêrsim û Amed

yan li Sason

û Ararat

ez çi bêjim

yan her mitik, zinar

deşt û nihêl û newal

li her deverê xaka te birîndar e…!!??

Welato

roja cejnan jî şahî li te nîne!!

ala te tête hildan

Xwîn dirije…!!??

Lawên te qurbana azadiya te ne…!!

Welato

dîroka reş

dîsa pelê tekoşîna me sor kir…

li şûna {Simaîlê kurê Birahîm}

li cejna qurbanê

bernanê me bûn qurban…

ma cejna qurbanê divê xwîn birije??

Mixabin

Cejna qurbanê xwîna me rijiya…

Kurdên me qurban in.

Canê me qurban e,

û Ji bo azadiyê em tev de qurban in

1/2/2004